

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Sal:1984

Hejmar:12



"Z A R O K F Ê K Î Y Ê M A L A N E"



Ji bo kulîlkê..

Bi a min îro her weşanên kurdî, ji bo pêşdexistina edebiyata kurdî ya nivîsandî gavek e. ji bo vê yekê jî me hemûyan alîkariya hev dîkarin hevdû bi pêşxînin.

Kulîlk jî yek ji van weşanên kurdî ye. Heta ku ji destê min bê ez ê alîkariyê bi kovarên mîna "Kulîlk"ê û hemû weşanên kurdî re bikim.

Bi silavên biratî

F.Cewerî

- RONÎYA ME -

Hun bixwînin zaroyê me
Ji bo şîn bibe xaka me
Çavê me li rîya we !
Hun bixwînin ronîya me.

Da ronahî be, li ber çav,
Ew tarîbuna her gav,
Wek kanîya zelal av
Hun bixwînin li we silav.

Em diburin, hêvî hun;
Riya me bu dawî kin,
Gulên dara pelên şîn,
Hun kulîlkê dilê me.

Em bi we serbilindin,
Hun şepalin, pir rindin,
Ji ronîyê dibarin,
Hun kulîlkên KURDISTAN...!

19.1.1984

Rênçber / Bulgarien

MEYMÛN Û DADEMENDÎ

Di daristanekê de gelek lawur (heywan) hebûn, di nav wan de jî meymûnek hebû. Wî meymûnî bi dademendiya xwe gelek bi nav û deng bû. Dema pirsek heywanan çêdibû an jî li ser tiştê li hev ne dihatin, ew diçûn cem meymûnê dademend, ji bo ku her kes bikaribe mafê xwe bistîne.

Meymûnê tim digot ku "hemû lawur (yên ku di çêrin an jî goşt dîxwun, piçûk an jî mezin) li pêş dadgehê bi erk û mafên xwe wek hev in." Tu dem derbas nedibû ku meymûnê dademend gotina xwe bi kar nedihanî.

Ku hun bawer nakin, de ka em bi hev re goh bidine mesela du pisîka, ku diçûn cem meymûnê dademend.

Rojekê du pisîk serîkî penêr li erdê dibînin, lê bi tu hawayî li ser pahrkirinê li hev nakin. Her dû pisîk ra dibin diçûn cem meymûnê û mesela xwe jê re dibêjin. Dademendê hêja radibe mêzîna xwe hazir dike û seriyê penêr digre dike du perçe û datîne ser mêzînê, mêzînê bilind dike, lê çî mixabin alîkî wê



sivik, aliyê dî giran tê. Meymûnê dademend dest dihavêje perçê mezin û bi lez gepek lê dide, ku her duyan bike wek hev lê vê carê perçê dî girantir dibe. Carekê dî bi lez destê xwe diha vêjê perçê penêr û gepek lê da. Lê ji bextê xerab re dîsan jî alîkî ji yê dî girantir tê. Pisîkên reben dibînin ku penêrê wan xelas bû û dawiya parvekirinê nehat. Yek ji wan dibêje: -Qazî efendî, bese ezbenî. Yê mayî ji me re bihêle... em li hev hatin û em carekê dî li hev naxin. Meymûnê dademend rû li ken bû û bi zima nekî şêrîn got: -Li hev hatin tişteke baş e, li hev hatin tişteke baş e... Û pêvîste ku pisîk li xwişka xwe neheçiyê ne kê. Xwedê parêz karê we be.


Pisîkê, penêrê mayî ji meymûnê xwest, meymûn gelek zarteng bû û bi dengekî bilind bersiv da û got:

-Pisîkno, hun dixwazin ji cem min herin û kirê ya dadgehê nedin? hun nizanin ku qanun kirê danê pêvîst dibîne?.

Bê guman pisîk bersivê nade û newêre bike nîyew nîyew. Dîtirse ku meymûn bê bextîyekê lê bike ku pisîk xeberan ji dadgehê re dibêje û wê bide ber dadgehê!.

Kardox

M I J Ū L Î



Gelo ew çî heywane ?

Heke tu hejmaran yeko-yeko bigihîni hev, dê tu bizanibî ku çî heywan e. Lê ji hejmarâ I-ê dest pê bike û li gor rêzê heta bi 50 yan here.

Paşê reng bike û navê wî binivîse..

(.....)

JÎ DAYKA MÎN RE

Tu çilmisî,wekî ez tim gul vedim,
Bedew û kaw,dayka min a hezkirî.

Tu miçiqî, wekî ez tim pêl vedim,
Xêrxwaz û qenc,dayka min a hezkirî.

Tu temirî,wek ez tim bişixulim,
Bo merivan dayka min a hezkirî.

Te spî kir por-guliyê xwe bi xema,
Ku bê xem bim,dayka min a hezkirî.

Zede li te ket,ku ez bimînim bê zede,
Şemdana min ,dayka min a hezkirî.

Te emek rêt,lê ew deya ne çûye,
Hisreta min,dayka mina kesirî,

Dayka min a çerçirî.

PIRÎSKÊ MIHOYÎ

PÊKENÎN

Rojekê mirovek diçe bajarekî pir mezin,
ku xanî û kesrên wê gelek bilind in.

Diçe nava bajêr û ji xwe re digere, ha li
vir û ha li wir, ha li vî aliyê û ha li wî
aliyê, carekê digîje ber avahiyeke pir bi-
lind. Mêrik dimîne ecêb mayî û dibêje:
-Errrrriik-lawo, ev çi avahiyeke bilind e
lo. Kuro gelo evana çend xanî danîne ser hev ?
de ka ez wan bihejmêrim.

Radibe bi qasî nîv saetê wan dihejmêr e
û digîhêje not û nehan (99).

Di vê nav berê de yekî çav-vekirî wî di-
bîne û tê cem.

-Kuro ma çima tu van xaniyan dihejmêrî ?,
ma tu nizanî ku qedexe ye ?.

-Na, bi Xwedê min nizanibû ku qedexe ye.

-Na! divê tu not û neh banqenotan nidî,
heqê ku te ew hejmartine.

Mêrik reben radibe not û neh banknotan di
de wî û bawer dike, ku bi rastî hejmartina
xaniyan qedexe ye û bi heq e.

Piştî ku mirovê bajarî ji ba wî diçe, ew
ji xwer hêdîka dikene û dibêje:

-kih kih kih, çi mirovekî bê aqile, min sed
xanî hejmartibû wî heqê not û nehan ji min
send.



P Ê Z A N Î N

1-Mirovekî şeş(6) keçên wî hebûn
her keçek birakî wê hebû.

Gelo hun dizanin çend zarokên wî
mirovî hebûn ?

.....

2-Mirovekî û kurê xwe swarê trom-
pêlê dibin,diçin derekê. Bi rê de trom-
pêla wan diqulube,bav dimre.Ambulans
tê kurik dibe nexweşxanê.Dixtor tê ku
birînên kurik derman bi ke.Lê dema dix-
tor kurikê birîndar dibîne,dibê:

-Heyvax ev kurê mine.

Gelo bo çi dixtor wa dibêje ?

.....

SER PÊHATIYA GUR

Mîhek li mêrgekê bi tenê diçêrîya, rojê kê fikirî û ji xwe re go: "Pa qey ez dînim, ku bi serê xwe li van çolan diçêrim. Na, divê ku ez ji xwe re natorvanekî bigrim, da ku canê min bi parêze". Hê weha difikirî, hew dît ku kûçikek (seg, se) di ber wê re, derbas bu. Mîhê zû deng li kûçik kir û got: -Birayê kûçik, gelo tu nayê ji min re natorvanîyê nakî?

Kûçik'î boçika (dûvik) xwe kil kir û got: -Tu dê rojê çukasî bidî min?

Mîh hebekî fikirî û bersiv da: -Ezê rojê sê tas şîr bidim te û ez ti ka -rekî giran bi te nakim. Tu tenê natorvanîya min bikî da ku tiştêk bi min neyê.

Kûçik û Mîhê bi vî awayî li hev kirin. Mîhê rojê sê tas şîr da kûçik. Her roj, her ku mîh diçu mêrgê diçêrîya, kûçik diçu natorvanîya wê dikir.

Rojekê kurek di ber mêrgê de derbas bu, nihêrî ku mîhek li mêrgê diçire. Gur ber bi wê çu û jê re got:

-Qey tu nizanî, ku ev mêrga ha ya min e, tu bi destura kê li vê mêrgê diçêrî?



Mîhê piştî ku gîyayê di devê xwede çut û got:

-Ez ji te bawer nakim, ku ev mêrg ya te ye. Ger tu li mêrgê xwedî derdikevî, divê ku tu ji min re sond bixwî, da ku ez ji te bawer bikim. An na ez ji te bawer nakim.

Gur çend gavên din ber bi wê de avêt û got:

-Baş e, ka sunda te çî ye, tu ji çî bawer dikî ?


Mîhê bi serê xwe zîyaretek nîşanî gur da û got:

-Divê ku tu sê gavan ber bi vê zîyaret' a ha bavêjî û bêjî "Bi vê ziyaretê ev mêrga ha ya min e". Hingê ez ê ji te bawer bikim, ku ev mêrg ya te ye.

Gur, pêşniyar a mîhê qebul kir û gavên ku ber bi ziyaretê ve avêt hejmart:

-Ev yek, dû, sê. Bi vê ziyaretê ev...

hîn peyva wî di devê wî de bû, kûçik ji nav devîyê pekiya û xwe avêt ser wî. Di dû re ew danî erdê û wî ji wê rewşê xis- te rewşekî dî. Gur, bi zorê xwe ji nav lepên kûçik derxist û bazda. Demekî bêî ku li paş xwe binêre revîya.




Di dû re sekîni û li paş xwe nerî, gava ku dît kes li dû wî tune, hêdî hêdî meşiya. Piştî demekî, dîsa di ber mêrgekê re derbas bu, nêhêrî ku cahniyek xam li mêrgê diçêre. Hema çu cem û jê pirsî: -Te ji kî destur standîye, ku tu li vê mêrgê usa diçêrî? Wele ez ê te bixwim Cahniyê stûyê xwe xwar kir û got: -Hey tu wê min bixwî, were li min siwar be, da ku miradê min di çirika min da nemîne.

Gur got :

-Baş e!

Gur xwe avêt ser piştî cahniyê û lê siwar bu. Cahniyê du-sê lotik(çindik) da xwe vir de û wê de bazda. Di dû re ber bi gund bazda û kete nav gund. Gundî rabun ku çî bibînin, ku waye gurek li cahniyê swar e û cahnî vir de û wê de lotikan li xwe dide.

Gundîyan bi dar û beran êriş birin ser gur. Dîsa ew ji wê rewşê xistin rewşekî din. Gur, xwe bi zor ji nav destên wan derxist û bazda. Çû li serê çiyakî bilind sekîni û xwe bi xwe got:



-Ku xwdiyên min hebûya, heqê wan bû ku bi dîvê min bigirtana û ez li pelika guhêa van teht û daran xistama. Ma lavo, bavê te sofî bû , kalikê te li hespan siwar bûbû, ma ji te re çî, ku tu herî li hespan siwar bî û bi ziyaretan sond bi xwî?!! ele xwediyê min tune ye, ku xwediyê min hebûya, heqê wan bû ku ez bikuştama.

Di wê demê de, zilamekî jî, ji ber baranê xwe daye bin dalda tehtekê, Gave ku dengê gur çû guhê wî, hema ji nişkeve ji cihê xwe rabû û got:

-Hema ji min çêtir tune!

Û bi teriya gur girt, li wan teht û daran xist. Gur xwe bi zor û bi nîv mirîti ji nav destên mêrik derxist û bazda. Çû serê çiyakî asê, li dora xwe mêze kir û got:

-Lawo, ma vê zemenê biye ku yek hew diwêre li mala xwe galgalekê (peyv, gotin) bike. Ma ev çî zeman e gidî ?.

F. CEWERÎ



ZARO YÊ TÊ BÊ GUNEME!

Te ez bi evîna xwe bê hiş xistim,
Bi bejn û bala xwe ji şehnazê daxistim,
Loman ji min neke welato!
Ez hîn zaro yê te bê gunê me,
Her dem li nik te me!

Aramke welato !

Nûgehên te yên nûjenbar,
Namînin li bin solên teresên har,
Ew serfîraz in ew serfîraz in,
Stû xwarê te me, berdestê te me,
Kurdistana birîndar,
Taca bûkan bi nalîna tera hate xwar

Aramke welato !



Mij û ewr, toliya li me dibarînin,
Em jî tariyê li keleşan bibarînin,
Dilên wan jî pêsîran hilçînin.

Emê bilindkin ala rengîn,

Ez im, ez im zaroyê te yê bengîn,

Emê bilindkin,

Ala azadîyê li ser baskên

kevoka spî ,

Mizgîna aştiyê pê re

hildin bi rûkî spî,

Aramke welato !

Hezar salek ku tu mayî zindî

Kî di bêje kesî hîn tu nedî

Ew hov û gidiye ne rind e,

Aramke welato !

Kawa yê gehreman,
Tu rizgarkirî ji talan,
Gulên yasemîn şigan dan,
Pilinga li çiyay serî hildan.

Aramke welato !

Tu bûyî gulistan,
Meşakir Kurdistan,
Keç û xortan dan ser milan

Aramke welato !

Soz û peyman,
Bi serê şêx Seîd, Qazî Mihemed,
Bi namus û abrûya Leyla Qasim

sond xwarin,





Çawa Filistîniyan bi Qudsê
sond xwarin,



Çawa Ho Shî Minh bi Saygon
sond xwar,

Û çawa Pêşmergê nenas bi axa niştiman
sond xwar,

Wisane jî hîm û latên te, bi şîrê te
sond xwarin,

Ku li hemî şûnek û şarek bibin
dinamît û volkan

Aramke welato !

Çiyayên ku bi xwînê hatine avdan

Zarokên şoreşger anîne meydan

Bi lehengî li wan dîkin lêdan

Aramke ! Aramke !



Gurzek gul di dest da,
Awirek li te hilda,
Berê xwe da rojhilat,
Derbazkir sînorek ji polat,
Tevlî destgirtiyê xwe.

Bi te re xwe germkir
Li ber wî arî
Bi lêvên hingivî
Ji te re gotin ev diyarî.

Aramke welato û bi kene,
Askên ne bez li dor te ne.

Aramke ! Aramke !
../..


Têbînî:

Xwendevanên hêja !

Ev parçê helbesta ha alî xwendevanekî
Kulîlkê, bi navê Kardox hatiye nivîsandin.
Ji ber dirêj bûna helbestê me pêvist dît
ku yê mayî di hejmara pêşî me de binivî-
sin.

MAMIK

- 1- Spiye spiye
bê dev û bê deriye
Gelo ev çi ye ?. (.....)
- 2- Post heyê
mû tuneşe
xwarin heyê
pîsî tuneşe.
Gelo ev çi ye ?. (.....)
- 3- Zerêle badibe
reşêle swar dibe
hûrikê malê şa dibe
Gelo ev çi ye?. (.....)
- 4- Sêniya savarê
li ser guliyê darê
Gelo ev çi ye?. (.....)
- 5- Hil tîto mil tîto
şêx zeyneba dûv rûto
Gelo ev çi ye ?. (.....)
- 6- Quto-quto eba kesko.
Gelo ev çi ye ?. (.....)
- 7- Hilindir bilindir
kur ji bavê bilindtir.
Gelo ev çi ye ?. (.....)



TIRKIYE

26

SURIYE

Diyarbakir

Kerkuk

Kermanshah

DE R YA SPİ

IRAK

IRAN

IRAN

SOVYET

DE R YA HEZİ

YEKİTTYA

QAD : 520.000 km²

NÛJMAR : 24.000.000 -

www.arsivakurdi.org

COXRAFIYA KURDISTANÊ

Şagirtên xoşevîst ! Me xwest ku em li ser coxrafiya Kurdistanê, ji we re hin tiştên ku em dizanin pêşkêş bikin.

Welatê me, li Rojhilata-Navîn, di navbera Tirkiyê, Yekîtiya Sovyet, Îran, Îrak û Sûriyê de ye.

Cîranên me:

Li Bakûr: Yekîtiya Sovyet û Tirkiye,

Li Rojhilat: Îran,

Li Başûr: Îrak û Sûriye

Li Rojava: Tirkiye ye.

Q A D

Wekî ku hun ji dizanin, Kurdistan di navbera çar(4) Dewletan de hatiye parvekirin. Bi tevahî çada Kurdistanê nêzîkê , 520.000km² . ye. Em dikarin vava waha bidin nîşandan.

Kurdistana Tirkiyê (nêzîkî): 250.000km².

Kurdistana Îranê " " : 175.000km².

Kurdistana Îraqê " " : 73.000km².

Kurdistana Sûriyê " " : 23.000km².

Dirêjahî : Ji bakûr heta başûr. 1000 km.

Firehî : Ji rojhilat heta rojava. 750 km.

ÇIYAYÊN KURDISTANÊ

Çiyayê herî bilind li Kurdistanê çiyayê Agirî ye. Bilindahiya çiyayê Agirî: 5165 m. ye. Di dû wî de çiyayên bilind:

Çiyayê Reşko : 4168 m.

" " Cîlo : 4116 "

" " Sîpanê Xelatê : 4058 m.

" " Piçûk : 3899 m.

" " Satê : 3811 m.

" " Mor : 3807 m.

" " Başêt : 3684 m.

Çiyayê Reş : 3630 m.

" " Tendûrek : 3660 m.

" " Munzir : 3463 m.

" " Mengenê : 3412 m.

" " Çewligê (Bîngol) : 3194 m.

" " Herekol : 2953 m.

" " Nemrûd : 2828 m.

" " Mereto : 2773 m.

" " Xaçêreş : 2689 m.

Çiyayê	Şerefdîn	:2544 m.
" "	Cûdî	:2089 m.
" "	Qerejdax	:1938 m.
" "	Mazî	:1452 m.
" "	Sof	:1496 m.
" "	Raman	:1260 m.

ÇEM Û AVÊN KURDISTANÊ

Kurdistan ji alî gol û çeman de gelek dewlemend e. Di vê hejmarê de, me bi kurtî navên hin çeman nivîsiye. Di pêş de, em dê li gorî hêz û karîna xwe bi firehî ji xwendevanan re pêşkêş bikin.

Çem û avên Kurdistanê bi gelemperî li jêr nivîsandîne.

DÎCLE Û FERAT! Di cîhanê de bi nav û deng in û seranserê Kurdistanê diherikin.

Dirêjahiya Ferat :2800 km.

Dirêjahiya Ferat di Kurdistanê de 1110km.

" " Dicle :1900 km.

" " Dicle di kurdistanê de:600 km.

Çemê Aras :1059 km.

" Mûrad : 722 km.

" Zapê Mezin: 450 km.

- Çemê Zap êpiçûk ;200 km.
 "" Ava Reş :148 km.
 "" Xabûr :...?...
 "" Ava Botan :...?...
 "" Berazgirê :...?...
 "" Ava Şîn û w.d.

GOLÊN KURDISTANÊ

Colên ku îro di Kurdistanê de he ne,
 bi xeml û rewşê xwe di cîhanê de bi nav
 û deng in.

Her wekî gola Ormiyê, gola Wanê, gola
 Hezarê (Golcîk), golên Satê û gola Hespan.

- Gola Ormiyê : 5775 km²
 "" Wanê : 3738 km²
 "" Hezar : 85 km²

Kûraniya gola Wanê zêdetirê 100 m. ye
 Golen Satê, nemaze di havînan de, mirov
 ji kêf û xweşiya wan têr nabe-

Di havînan de mirov dikare çar demsalan
 li dewr û berên golên Satê bibîne.

NIFUS (HEJMAR)

Heta ni ha, di derbarê hejmara gelê Kurd de, lêkolînek rast ne hatiye çêkirin.


Lêkolîn û îstatîstîkên rast bi tenê di welatên/welatek serbixwe de mumkûn e. Heta n ha, di vî warî de bi tevayî hejmarên texmînî û li gor nifûsa bajarên Kurdistanê hatine nivîsandin.

Tiştên ku heta îro hatine nivîsandin kêm-zêde wek hevin. Li gor hejmarên ku hatine nivîsandin, hjmara Kurdan di navbera 23-25.milyonî de ye û bi vî awayî ye:

Kurdistana Tirkiyê (zêdetirî) 12. milyon.

" "	Îranê	nêzîkê	6,5.	" "	" "
" "	Îraqê	" "	4,5	" "	" "
" "	Sûriyê	" "	1.	" "	" "
			<hr/>	24,0 Milyon	

Wekî dî jî nêzîkê milyonek(1) Kurd li Yekîtiya Sovyet û Lubnanê dijîn.



Bersiva hejmara 11'dan

1)Tiştên ku xwarinê şor û şêrîn dikin navên wan çine ?.

Bersiv: Xwêh . û .Şeqir .

2)Bi tirkî,kalem,kitap, defter,silgi ye. Bi kurdî navên wan çi ne ?-

B: Rênivîs , Rirtûk , Rirpel , Jêbir

3)Gelo di salekê de çend demsal hene û navên wan çi ne ?.

B: Havîn ,Rayiz Zivîştan .û .Bûhar .

4)Gelo di salekê de çend hefte,çend meh û çend roj hene ?.

Meh	Hefte	Roj
B: .12....	52.....	.. 365.....

5)Kurdên ku li serê çiyar li diji neyar şer dikin.Ji wan re çi tê gotin ?.

B: RÊŞMERGE !

6)Gelo Komara Mahabadê di kîjan salî de ava bû û di kîjan salî de faşilî


B: di 1946 de avabû,di 1947 de faşilî(faşil bû)

7)Amed, Silêmanî, Mahabad û Qamişlok li kîjan beşê Kurdistanê ne ?.

B:Li Kurdistanana Tirkîyê, li Kurdistanana Îraqê li Kurdistanana Îranê, li Kurdistanana Sûriyê

Apên dilovan, ez ji we re rismên hin parêz
(sebze) dişînim. Ez hêvî dikim ku hun rismê
min di Kulîlkê de çap bikin.

Azadlî salî



Balcanê sor



Kartol



Isot



Yiyar



Gêzer



Balcanê reş

XAÇEPIRS

	1	2	3	4	5	6	7	8
1						■		
2				■				■
3			■		■			
4								■
5		■		■			■	
6		■	■		■	■		
7	■							■

Çeprast:

1-Dawiya havînê û serê payizê, navê sê rojan, ku di wan rojan de bahoz û ba tê. Ji wê şêrîntir tuneye.

2-Bi kurtayî navekî zilaman. Pêş, pêşî.

3-Di muzîkê de notayek. Kenîse.

4-Di dîrokê de dewleteka Kurdî (berepaş).

5-Peyivî, axivî (berepaş). 6-Eşîr. 7-Roja 21'ê Adarê.

Serejêr:

1-Kovarek zarokan, bi zimanê kurdî. 2-Bi kurtayî navekî zilaman (berepaş).

3-Dîn (berepaş)

4-Paronavê kesîn, yê sêhimîn, ji bo nêr û mê

(berepaş) .5-Bi kurtî ji bo(berepaş)6-Za-
 rok,sebî,mindal(berepaş) .7-Cuwanmêr,dest
 vekir î.Pronavê yekemîn.

..... /

Bersiva rûpela 25'an.

- 1- Hêk.2-Kirnî (Gene)3-Beroş.
 4- Henar.5.teşî. 6-kezwan.7-Ker û hêstir.

Bersiva rûpela 11'an.

- 1-Şeş keç û kurekî wî mirovî he ne,bi te-
 vahî heft(7)zarokên wî he ne.
 2-Doxtor jin e û diya kurik e.

BERSIVA XAÇEPIRSA HEJMARA 11'dan

	1	2	3	4	5	6
1	D	E	R	S	I	M
2	E	V	E			E
3	R	Î	Q	E	F	
4	Î	N		V	Î	H
5		Î	R	A	T	

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 10:- skr
BIHA